Bidestxistina Îspata vaksînkirina bo COVID-19

NSW GOVERNMENT

Kurdish

Çawa bidestxistina îspata vaksînkirina bo COVID-19

Îspata vaksînkirina bo COVID-19 dê di nav ragîhandina derheqê vaksînên te de (**immunisation history statement**) li dû vaksînkirinê bihêt qeydkirin.

Li dû xwevaksînkirina bi vaksînên pêwîst, dê bikaribî **belgehnameya digital ya xwevaksînkirina bo COVID-19** jî bi dest xî: **COVID-19 digital certificate**.

Dikarî îspata xwevaksîkirina bo COVID-19 bi van rêyan bi dest xî:

- **Hesabê Medicare li ser înternêt: Medicare online account**
- **Express Plus Medicare app**
- **Qeydkirinên tenduristiya xwe: My Health Record**
- **Xizmeta bi navê Healthcare Identifiers Service**
- **Qeydkirinên australî bo vaksînkirinê: Australian Immunisation Register**

Hesabê Medicare li ser înternêt: Medicare online account

1. Hesabê xwe yê **myGov** veke (my.gov.au) û **Medicare** bibijêre
2. Ji beşê **Immunisation history**, vî beşî bibijêre: **View immunisation history**
3. Navê xwe bibijêre
4. Li **View immunisation history statement (PDF)** yan **View COVID-19 digital certificate (PDF)** bide

Express Plus Medicare app

1. Appê veke û derbasê bibe (sign in)
2. Ji beşê **Services**, **Immunisation history** bibijêre
3. Navê xwe bibijêre
4. Li **View immunisation history statement (PDF)** yan **View COVID-19 digital certificate (PDF)** bide (bitikîne)

My Health Record

Dikarî îspata xwevaksînkirinên bo COVID-19 ji Qeydkirinên tenduristiya xwe, My Health Record jî bi dest xî.

Ger te My Health Record hebe:

1. Hesabê xwe yê **myGov** veke (my.gov.au) û **My Health Record** bibijêre
2. My Health Record veke
3. Ji **Record Home** ya xwe îspata xwevaksînkirinên xwe bi dest xe yan ji rûpela xwe ya **Immunisations view** (**Documents, Immunisations** bibijêre)

Ger te My Health Record nebe, lê te karta Medicare hebe:

1. Malpera xwe ya **myGov** veke (my.gov.au) û xwe bigihîne **My Health Record**
2. Nasnameya xwe îspat bike û My Health Record bidozîne, miqayit be ku 'Erê' (Yes) bibijêrî bo agahîyên vaksînkirinê (agahîyên Medicare) têkevin nav My Health Record ya te
3. My Health Record ya xwe veke
4. Îspata xwevaksînkirinên xwe Ji **Record Home** ya xwe bi dest xe, yan ji rûpela xwe ya Immunisations view

Bidestxistina Îspata vaksînkirina bo COVID-19

Xizmeta Individual Healthcare Identifiers service (ger te karta Medicare nebe)

Ger te karta Medicare nebe û bixwazî bi rêya înternêt (online) îspata xwevaksînkirinên xwe bi dest xî, pêdiviya te dê bi Individual Healthcare Identifier (IHI) hebe. Ger te (IHI) nebe, dikarî bi rêya înternêt (online) bixwazî.

Bo bêtir agahdarî:

www.servicesaustralia.gov.au/individuals/services/medicare/individual-healthcare-identifiers/how-get-ihi

Li dû wergirtina IHI, dikarî îspata xwevaksînkirinên xwe bi rêya malpera myGov bi dest xî.

1. Malpera xwe ya **myGov** veke (my.gov.au) û **Individual Healthcare Identifiers service** bibijêre
2. Ji beşê **Services**, demên xwevaksînkirinê (**Immunisation History**) bibijêre
3. Li **View immunisation history statement (PDF)** bide (bitikîne) yan li **View COVID-19 digital certificate (PDF)**

Qeydkirinên australî bo vaksînkirinê: Australian Immunisation Register

Ger nikaribî îspata xwevaksînkirinên xwe bo COVID-19 bi rêya înternêt (online) bi dest xî,

di navbera 8ê sibehê û 5ê dû nîvro de, duşemê ta eynî (înîyê), telefone **Australian Immunisation Register** bike: **1800 653 809**.

Ji wan bixwaze bila belgeha demên xwevaksînkirinên te (**immunisation history statement**) ji te re rêbikin.

Gihîştina wê bi postayê dikare ta 14 rojan bidomîne.

Ger te wergêr divêt, telefone **Xizmeta Wergerê** (**Translating and Interpreting Service TIS**) bike: **131 450**.

Lînkên sûdmend

Bo bêtir agahdarî derheqê çawabidestxistina belgeha demên xwevaksînkirinên te de (immunisation history statement) **koda QR li jêr skan bike (scan)**

Bo bêtir agahdarî derheqê vaksînkirina bo COVID-19 de li NSW **koda QR li jêr skan bike (scan)**

Koda QR li jêr skan bike (scan) bo dîtina hêsantir rêya bidestxistina îspata xwevaksînkirinên xwe bo COVID-19

NSW GOVERNMENT

Bo bêtir agahdarî malpera **visit nsw.gov.au veke**

August 2021 © NSW Health.